

Gera navnetewî li endamên malbatê

Agahiyên li ser parastina daneyan

Ger. Bihevghandin. Yekkirin.

Xizmeta gerê ya Xaça Sora Almanî (XSA-Xizmeta gerê) piştgiya mirovên bi sedema şerên çekdarî, wêranî, rev, koçberkirin yan penaberiyê ji kesên xwe cuda bûne dike. Ew alîkariyê dike daku li mirovên xwe bigerin, careke din têkiliyê bi hev re bikin û malbatan bikin yek.

Pêdiviya me bi çi daneyan bo karê me heya?

Ji bo ku em li kesekî bigerin, pêdiviya XSA-Xizmeta gerê bi gelek agahiyan li ser wî kesî heye. Ew jî daneyên wek mînak Nav, rojbûn, daneyên li ser cihê jê hatî û riya revê. Wekî din jî rewşên ku bûn sedema jihev cudakirina malbatê ji bo gera me pêwîst in. Li kêleka vê jî pêdiviya XSA-Xizmeta gerê bi daneyên têkiliyê yên kesê digere heye û dixwaze nas bike ka bi çi awayî ew xwediyê kesê lê digere ye. Her weha jî wêneyekî kesê digere jî dikare alîkariya gerê bike.

Ev dane hemî (wêne jî) daneyên kesane ne, pêdiviya me pê heye ji bo ku li gora berjewendiya kesê digere û yê lê tê gerîn bèn bikaranîn.

Ji bo çi em daneyan bikartînin?

XSA-Xizmeta gerê daneyên kesane ji bo van armanca bikartîne:

1. Gera li kesên windabûyî
2. Aşkerekirina çarenûsiyan û
3. bihevghandina malbatan.

Dane bo kesên din tîn şandin?

Em daneyên kesane bi giştî gelekî bi nehênî bikartînin. Ji bo gera li kesekî em pirsra gerê li nav tevna xizmeta gerê belavdikin (Yekîtiya XSA-Xizmeta gerê bi Komîta Navnetewî ya Xaça Sor (KNXS) û Xaça Sor û Komelên Heyva Sor yên welatên din re). Li welatên ku tê texmînkirin kesê lê tê gerîn li wir e, xizmeta gerê ya wî cihî hewil dide ku agahiyên din li ser cihê mana wî kom bike. Di çarçoveya vî karî de dibe bê xwestin daneyên kesane bo saziyên din bèn belavkirin, wek mînak

- saziyên dewletê (wek mînak rêvebiriya biyaniyan, rêvebiriya tomarkinê, zindan),
- saziyên navnetewî,
- nîştexhên bajêr û gund yan mezinê eşîrê,

Daneyên kesane dikarin ji bo armanca gerê bèn belavkirin jî (wek mînak gera di internetê de bi wêne www.tracetheface.org, bernameyên radiyo yên hevbeş yên KNXS û BBC / Somalia, belavkirina lîsteyan li cihên giştî yan li internetê).

Parvekirina daneyan bi cihên din re tenê tê kirin dema ev yek ji bo pêkanîna karê gerê gerek be. Di çarçoveya pêdiviyên şîroveya pejirandinê de hun dikarin hin welatên taybet, cihên din yan belavkirinê jî, ji nav çalakîyên me yên gerê derxînin û nepejirînin.

Heta kengî dane li ba me tomarkirî dimînin?

Daneyên hun didin me heta ku pêdiviya bikaranîna wan bo ku em bigihîjin armancên li jor hatine ziman hebe li ba me dimînin tomarkirî.

Çi rêbaz li ser bikaranîna daneyan tèn meşandin?

Mafê parastina daneyan ji bo her kesê têkildar heye. XSA-Xizmeta gerê di karê xwe de, li gora rêbazên Qanûna-Parastina daneyan-Xizmeta gerê (SDDSG). dikeve tevgerê. Wekî din em bi rênişankirinên Rêkeftinên bingehîn-Parastina daneyan (RB-PD), her weha Qanûna Parastina daneyan ya Federal (BDSG) ya bikaranîna daneyên kesane ve girêdayî ne. Eger pêdiviya karê me hebe em daneyên we bi Tevna-Xizmeta gerê re parve dikin, aliyên têkildar Rêbazên-Helwesta-Parastina-Daneyan yên hevbeş didin ber çavan. Weha em dixwazin bigihîjin encamê ku bi kêmayî daneyên we li ba hevkarên me yên tevnê li welatên din jî bi awayekî têt bêt parastin.

Çi mafên we ji bo parastina daneyên we yên kesane hene?

Mafê we heye hun bêpere agahiyan li ser hemî daneyên kesane ku me tomar kirine bistînin. Li kêleka vê yekê mafê we yê serrastkirinê heye eger me ev dane ne bi awayekî rast tomar kiribin. Eger hun tomakirina daneyên xwe yên kesane nema bipejirîn hun dikarin bi me re parve bikin, em ê biriyara rakirina wan daneyan yan asêkirina wan bidin.

Şîroveyeke pejirandinê ku XSA-Xizmeta gerê dabe dikare herdem bi tevayî yan beşek jê bi şûnve bê kişandin. Divê hay jê hebe ku pejirandineke wêneyê kesê lê têt gerîn li ser pankertekê, pirtûkek wêneyan ya listeyeke tevahiya cihanê hatibe belav kirin bi şûn de kişandina ji bo demên pêş çêdibe ne ya tiştên hatine çapkirin û belavkirin. Daxwaza bi şûn ve kişandinê bi nivîskî û bi nav li ba XSA-Xizmeta gerê ya München, Chiemgaustraße 109, 81549 München, E-Mail: tracing@drk-suchdienst.de (yan li ba cihê berpirsiyar çêdibe).

Hun dikarin têtikiliyê bi kê re deynin (cihê berpirsiyar)?

Eger pirsên we ji bo bikaranîna daneyên we yan bicihkirina mafê we yê bidestxistina agahiyan, serrastkirin, rakirin yan asêkirin, bişûndekîşandinê hebin hun dikarin berê xwe bidin cihê XSA-Xizmeta gerê ya ku we ji bo gera li kesekî têtikilî pê re danibû.

Muhr yan nav, navnîşan û nemra têtêfonê ya cihê kar

Eger hun kesekî têtikildar nas nekin, hun dikarin berê xwe bidin cihê kargêriya XSA-Xizmeta gerê:

Deutsches Rotes Kreuz
-Generalsekretariat-
Team 22/Suchdienst-Leitstelle
Carstennstraße 58
12205 Berlin
Tel.: 030 / 8 54 04 -170
Fax: 030 / 8 54 04 -458
E-Mail: suchdienst@drk.de

Her weha Nûnera me ya parastina daneyan-xizmeta gerê jî Frauke Weber wek kesê têtikildar amade ye, hun dikarin bi riya E-Mail: frauke.weber@drk.de têtikiliyê deynin.